

## Hevpeywîn digel rêzdar Elî Şemdîn

Hevpeywîn digel rêzdar Elî Şemdîn Endamê Deftera Siyasî (PDPKS) û Nûnerê wê Partiyê li Herêma Kurdistana Îraqê, bi hilkefta 80 saliya damezrandina PDKÎ

Dom»R:5





## Heval û hevkarên hêja li malbata Agirî

Niha ku dibînim karwanê xebat û tekoşîna ''Agirî''yê bênavber berdewam dike û gihaye hejmar 500 a xwe, dixwazim ji dil û can vê deskevta mezin û buhagiran ji we û hemû xwendevan û şopînerên Agirî pîroz bikim. Pêncsed ne tenê hejmarek, belkî nîşana hewildanên dûr û dirêj û bênavber e di pêxem şopandina heqîqetê, hişyarkirina civakê û geşedana pênûs û hizrên ku li hember asmîlasiyona zimanî......

Dom» R:9

*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (500)23-08-2025 Buha (1000) Tûmen*



## Peyvên ji bo Agirî

Bi hilkefta 500`mîn hejmara rojnameya Agirî, bi dilgermî û serbilindiyek mezin ve pîrozbahiyek germ ji hemû xebatkar û xwendevan û welatperwerên Kurdistanê dikim.Bo min wekî damezrêner û rêvebrê qonaxa yekem a Agirî, çi hesteke xweş û rûmetek mezin e ku bêjim îro ne tenê bîranîna 500`mîn a rojnameya Agirî ye, belkî di heman demê de bîranîna rêwîtiyek dirêj û maratonek 22 salî ye ku ji dema damezirandina Agirî de, em wekî wan zarokên ku ji çalepîtiyê ve dest pê bikin........

Dom» R:6

# Ji Çiyayê Agîrî ve bo Rojnameya Agirî




**N. Nûredîn Sofîzade**

Agirî ev navê bi heybet, ev çiyayê bi selabet, ev dergûşa berxwedanê, ev kela berxwedanê ku bi dirêjahiya dîroka xebat û doza berheqe gelê Kurd de, êvirgeha geleyk şoreşvanan bûye û gelek tevgerên mezin li xwe girtine, bo gelê me remz û sembolek e, û bo dujmin û dagîrkeran jî cihê şikan û kevtinê bûye.

Bi wan taybetmendiya Agirî bûye navek pîroz ku îro rojê bi hezaran xortên Kurd navê wan Agiriye, Agirî bûye Tablo, lewra dema ku di payîza sala 2003 a Zayînî de Hizba Dêmokrat bi cehda hin kesên xemxor biryar da ku Rojnameyekê bi zimanê Kurdî û Kirmanciya jorîn û bi tîpên Latîn biweşîne, yêkim navê ku bo vê Rojnamê hate ziman ilham vergirtin ji nav û remz û sembola Agirî bû.

Agirî îro 500 mîn hejmara xwe bi şanazî ve weşand, ev Rojnameya bi ked û îza û dilsoziya gelek kesên derwest û keddar bê rawestan hatiye heta geheştiye Îro anku 500 hejmar ku hilgirê manşêt, gotar , mijarên siyasî, civakî, çandî, dîrokî û ..... li xwe girtine.

Rast e Agirî ji aliyê Hizba Dêmokrat û bo şirove û gihandina siyaset û helwêstên vê Hizbê û tevgêra Kurd li Rojhilatê Kurdistanê tête weşandin, lê qet xafil nebûye ji pirsa netewî û wek bazneyekî mezintir û netewî tev geriya ye.

Bi hilkefta weşana 500 mîn hejmara Agirî, pîrozbahiyekî germ û bi qasî bilindahiya çiya yê Agirî li hemî wan kesan dikin ku di çap û weşana Agirî de ked dane û pênûsa xwe bo dewlemendkirina Agirî xistine kar.

**Pîroz be derçona 500 mîn hejmara Rojnameya Agirî**

## Daxuyanî bi hilkefta 80emîn salvegera avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê

80 sal xebat lipêxema mafê netewî, dêmokrasî û dadperweriyê de



## Peyama“Mistefa Hicrî” Sekirtêr Giştî yê Hizba Dêmokrat

Dom » R:6



## Agirî sembola xwendin û berxwedanê

Dom » R:9

# Daxuyanî bi hilkefta 80emîn salvegera avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê

**- Xelkê Demokratperwer ê Rojhilatê Kurdistanê!**

**- Xortên netewa Kurd ên li hemû beşên Kurdistanê!**

**- Azadîxwazên xebatkar ên welatê Îranê!**

**- Dostên Hizba Dêmokrat û netewa Kurd li seranserê cîhanê!**

80 sal xebat lipêxema mafê netewî, dêmokrasî û dadperweriyê de

25ê Gelawêja 1404 a Rojî (16ê August 2025), 80 sal biser avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê re derbas dibin û ev Hizba pê dawîêje nava 81emîn sala tekoşîna xwe. Bi vê hilkefta taybet û bi şan de silav bo rihê avakerê Hizbê û serwetir ji hemûyan "Pêşewa Qazî Mihemed", herwisa silav bo canê paqijê hezaran şehîdên 8 dehikan a xebata Hizba Dêmokrat, li rêzeya pêş a wî karwanî, Serkomarê Kurdistanê û 2 Sekreterên Giştî yên Hizbê, "Dr. Qasimlo û Dr Şerefkendî" dişînin.

80 sal berî niha, Hizba Dêmokrat li berdewamiya 3 sal tekoşîna nihênî ya komeleya "J.K"ê de û li ser bingeha hemen rêkxiravê lê bi cîhanbîniyek nû, hate avakirin.

Ev Hizba her li yekem sala tekoîşîna xwe de bi mifahvergirtin ji rewşa navxweyî û deverê li vê serdemê, Komara Kurdistanê ava kir.

Tevî ku temenê vê Komarê ji salekê kêmtir bû lê destkevt û karlêkeriyên vê, rengekî Kurdistanî û hevdem zindî da tevgera netewiya Kurd, bi vê wayetê ku pêvajoya dîroka piştî Komarê de jî berdewam e û geşe kiriye.

Tekoşîna vê Hizbê piştî nemana Komara Kurdistanê li dijî rêjîma dîktatrorî ya Pehlewî jî heta herifîna rêjîma paşayetiyê bi şêwazên cur bi cur, berdewam bû.

Têkoşerên vê Hizbê, li rêzeya binavbangtirîn, demdirêjtirîn û xweragirtirîn girtiyên siyasî li heyama desthilatariya Mihemedriza şah de bûn.

Mezîntirîn serhildana çekdarî ya serdema dawî şahê Îranê, li salên 1346-47 a Rojî hemberî salên (1967-68) a Zayînî de qewimî ku têkoşerên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi rê ve birin û nirxa vê jî bi canê xwe dan.

Xelkê Kurdistanê bi vê armancê ve li serhildana seranserî ya sala 1357 a Rojî ya gelên Îranê de çalakane beşdarî kirin ku dêmokrasî û azadî, cihê sitem û dîktatoriyê bigre; Gelê Kurd û gelên din ên li Îranê, êdî tûşî sitem û cudatîdanînên netewî nebin, lê rêjîma ji nûhatî serakar, li hember pirsa firenetewîbûna Îranê û mafên netewî, hemen siyaseta rêjîma berê anku înkarkirin, sitem, şer û tepeserkirin li pêşxwe girt.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, hemû şêwazên aşitîxwazane ên wek danûstandin digel Têhranê, beşdarîkirin li hilbijartinan û gihandina peyama xelkê Kurdistanê bi şêwazeke aşitîxwazane ceribandin, lê Xumêynî yê avakerê rêjîma Îslamiya Îranê, şer li dijî xelkê Kurdistanê ragihand. Hizba me û xelkê Kurdistanê bi giştî, li rêfrandoma komara îslamî de beşdarî nekirin û rewatî neda rêjîmekê ku mafên bingehîn ên wan û xelkê Îranê bi fermî nas nekirûbû.

Hizba Dêmokrat bi dirûşmên dîjî Amerîkayî yên rêjîmê nehate xapandin; Sepandina hicaba bi zorê bi ser jinan li Îranê û jê standina destkevtên wan ên pêştir, êrîşkirin bo ser balyozxaneya Amerîka li bajarê Têhranê, bi barimtegirtina dîplomatên wan ji aliyê vê rêjîmê, tepeserkirina rojnamevanan û hizb û rêkxiravên siyasî, daxistina zaningehyan û bi rêxistina binav inqilaba ferhengî, şermezar kir û dengdan bi yasaya bineretiya vê rêjîma paremayî û dijî azadî û mafên bingehîn ên gelên Îranê bû, baykot kir.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, li rûberûbûn digel şerê sepandî ji aliyê rêjîma îslamiya Îranê bi ser xelkê Kurdistanê de bi tenê nebû, rêkxiravên siyasî yên din ên Kurdistanê jî bi pêka şiyan û hêza xwe, beşdarî li wî şerî de kiribûn, lê giraniya şer li pileya yekem de li ser milê Hizba Dêmokrat û dehan hêzên Pêşmerge yên vê Hizbê li seranserê Kurdistanê de bû.

Hizba me, hevdem 2 berpirsayetiyên giran ên din jî kevtibûne ser mil. Ji aliyekê ve bo heyama çendîn salan, erkê birêvebirina piraniya deverên azadkirî yên Kurdistanê kevtibû ser milê Hizba Dêmokrat ku bi hevkariya dilsozaneya xelkê Kurdistanê, tevî dorpêçên hemûalî yên rêjîmê ku xistûne ser wan deveran, li birêvebirineke serkevtiyane de bû.

Li derveyê welat jî, hewldanek bi nirx bo gihandina dengê xelkê Kurdistanê bi raya giştî û rakêşana piştevaniya kor û komên mirovperwer û hizb û kesayetiyên pêşkevtî yên welatên Rojavayî bo aliyê xebata xelkê Kurdistanê, bi pêş ve bir.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li dîroka 80ê saleya xwe de şêwazên cur bi cur ên xebatê ceribandine û ewraz û nişîvên gelek zêde dîtine.

Çendîn caran şahidê serkevtin û şikest û keftin û rabûna xwe bûye.

Her 3 kesên yekem ên vê Hizbê û dehan endamên rêberatî, sedan kadr û serkirdeyên meydanî û fermandeyên bi wec, nêzî 5 hezar Pêşmerg û endam li çepera berevanî li armanc û xebat bo mafên netewî yên Kurdan de bi destê rêjîmên Îranê, şehîd bûne.

Pêbendiya vê Hizbê bi pirensîpên netewî, şoreşvanî, dêmokratîk û mirovperwerane û xebata berdewam û tejî qurbanîdanê, ev kiriye hêzeke siyasî ya naskirî û cihê rêzgirtin li asta Kurdistan, Îran û cîhanê.

Xuya ye ku li dîroka Hizba me de hekî rûpelên rohnî û bi cirîsk û destkevtên cihê şanazîkirinê hene û gelek jî zaf in, lê diyarde û bûyerên bi xisar û nexweştî jî hebûne. Wek mînak li hindek qonax û deman de Hizba Dêmokrat berwajiyê xwesta xwe, digel hizb û rêkxiravên din ên Kurdistanê, tûşî şerê çekdarî bûye; li nav xwe de jî ev Hizba, çend caran rastî jihevcudabûnê hatiye ku li encama wan cure bûyerên de xisar û zirazeke zaf hem bi Hizba Dêmokrat û hem bi tevgera şoreşgêraneya Kurdistanê kevtiye ku tevî mixabiniyê ji qewimîna wan bûyer û diyardeyên nexweştî li dîroka Hizba me de, ew hizba hewlê dide ku waneyan jê hîn be û rêgiriyê ji dubarebûna wan bikin.

Rastiyek tal e ku piştî 80 sal tekoşîn û qurbanîdanê, tevî rewabûna armancên me û rewatiya xebata me, hêj em bi negeheştine armancên bingehîn ên xwe ku rizgariya netewa Kurd li Kurdistana Îranê ji bindestî û bêmafiyê ye.

Li tevahiya vê dîroka 80 saliya xwe de Hizba me ti car ji aliyê rêjîma Îranê ve rê û derfeta yasayî ya tekoşîna siyasî pê nehatiye dan; Rêber, kadr û endamên vê Hizbê, bilî çend qonaxan, hertim neçar bûne li nav bajar û gundên welat de bi nihênî tekoşînê bikin, an li çiya û dûr ji welat bi şêwaza neasayî, li jêr agirê top û êrîşên esmanî û êrîşên serbazî û pîlanên terorîstî de tekoşîna xwe bidomînin.

Tevî wan hemû derbên pêketî û wan hemû qurbanîdanan, kariye li meydana xebatê de bi serbilind bimîne, ji pirensîpên bingehîn ên xwe derneketiye, serbixweyiya biryardana xwe, parastiye.

Li ti rewşekê de li dijî berjewendiyên tevgera Kurd li beşên din ên Kurdistanê de nesekiniye û tûşî şaşî an jirêderketineke siyasî ya wiha nebûye ku şermzarê dîrok û netewa xwe be.

Em bi şanaziyê ve dibêjin ku xelkê Kurdistanê li her rewşekê de piştevanîkirina xwe li vê Hizbê berdewam kirine û

Dom » R:3

# Daxuyanî bi hilkefta 80emîn salvegera avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê

Doma » R:2

nehiştine ku doza rêberên şehîd ên vê Hizbê bê rêvîng bimîne û çepera xebatkarên vê li ti qonax û sedemekê de betal bimîne.

Ev vê rastiyê dide selimandin ku armancên vê Hizbê û bername û siyasetên vê, ji hundirê xwest û daxwaziyên xelkê Kurdistanê ve hatiye.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ji mêjve ye ku ji rêkxiravek siyasî ya taybet bi çend qat û beşan an taybet bi beşeke Rojhilatê Kurdistanê derkevtie û li asta Rojhilatê Kurdistanê de bûye tevgerek netewî û azadîxwaz û giştgîr û seranserî.

Ev jî rastiyek e ku li wan salên dawiyê de gelek caran û bi şêwazên cur bi cur, her wek mînak li pêvajoya tevgera "Jin Jiyan Azadî"yê û Newroza milyonî ya bi şan a îsal de bi rohnî û eşkere xwe da xuya.

Ev bawerîpêkirina mezin a xelkê Kurdistanê bi Hizba xwe, hekî ji aliyekê ve bo xortên vê Hizbê cihê şanaziyê ye, ji aliyê din ve erk û berpirsatiyeke giring li destpêka dehîkek nû ya tekoşînê, ew jî li rewşa taybet a îro ya dever û Îranê, dêxe ser milê vê Hizbê. Em wek rêberatiya niha ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, li hember baweriya xelkê Kurdistanê, bejna xwe ditewînin û erkdar in û li ser milê me ye ku vê xoşewîstî û bawriyê biparêzin û bihêztir bikin.

**Dost! Dilsoz û piştevanên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê!**

Em li rewşekê de yada 80 saliya avakirina Hizba xwe dikin ku guherîneke erênî bo berjewendiya pirsa Kurd li deverê hatiye meydanê.

Dewleta Tirkiyê, piştî derbasbûna sedsalekê ji înkarkirina beşeke mezin a Kurdistan û netewa Kurd li wî welatî de û bêparkirina wan ji destpêkîtirîn mafên wan, neçar maye rêya îtirafkirin bi hebûna Kurd li bigre pêş xwe û rêberatiya siyasî ya tevgera Kurd li vê beşa Kurdistanê jî li praktîkê de amadebûna xwe bo çareserkirina aşitîxwazane ya pirsa Kurd li wî welatî, ragihandiye.

Li Sûriyê de xwebirêveberiya Kurdên Rojavayê Kurdistanê tevî guherîna siyasî ya welat û hewldanên deshilta nû bo jinavbirin û nehiştina statoya siyasiya Kurdan, kariye pêdegir be li ser pasrastina destkevtên xwe û piştgerim bi piştevaniya siyasî ya çend welatên Rojavayî, pêgeha xwe biparêze û soza bi fermîkirina mafên netewiye kurd li Sûriyê verbigre. Li Îraq û Herêma Kurdistanê, tê çavrêkirin ku bi lawaziya rêjîma Îranê û kêmbûna destêwerdanên li welatên deverê, rewşeke baştir bo Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi taybet bo çareserkirina pirsgirêkên digel Bexdayê, çê bibe.

Li Rojhilatê Kurdistanê de jî tevî ku Hizba me û rêkxiravên din ên siyasî û heta li derveyî sînoran jî li jêr givaşa siyasî, êrîşên mûşekî û dironî û pîlanên terorîstî yên rêjîma Îranê, parastî nînin, li encama pêgihîştina siyasî ya roj bi roj a zêdetir a xelkê Kurdistanê û hizbên siyasî de netewa me li dijî dîktatoriya komara Îslamî û piştevanîkirina netewa me li nasnameya xwe ya netewî, pêngawek mezin avêtiye.

Tevgera medenî û civaka medenî bi hewldan û tekoşînên çalakvanên medenî, tevî hemû astengî û lemperan, geşe kirine û bûne baskekî din a tevgera netewî û azadîxwaziya Kurdistanê. Yekîtiya wan 2 tevgeran bûye sedem ku Kurdistan her wekî li tevgera "Jin Jiyan Azadî"yê de selimand, her pêşeng û pêşrewê dijayetî digel dîktatorî û kevneperestî li asta Îranê de be.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ku li hemû deman piştevan û handerê xebata medenî û giştî ya xelkê Kurdistanê bûye, şanazî bi hişariya siyasî û netewî û xebata medenî ya xelkê Rojhilatê Kurdistanê dike, xwerêxistin û hevpeymaniya wan bi sermayeyek mezin bo gihîştina netewa me bi armancên ji mêjve ya rizgarbûn ji bindestî û bêmafî li Îranê de dizane.

Îran li rewşa niha de ji qonaxeke hestiyar a dîroka xwe re derbas dibe. Rêjîma Îranê piştî dehan sal deshilatiyê bi piştgirêdan bi tepeserkirina bi xwîn û talankirina serweta xelkê Îranê û bêparkirina hevwelatiyan ji destpêkîtirîn maf û azadiyan, bilî ku xelk û welatê Îranê tûşî mezintirîn qeyranên aborî, civakî û jîngehî kiriye, bi xwe jî nêzî encam û berhema siyasteta fitneçêkirian, terorîstî û serbaziyên xwe diçe. Tevî ku heta niha çend tirîlyon Dolar ji dahat û darayoiya xelkê Îranê li projeyên navkî, li berhemanîna curên mûşek û dironan, li teyarkirina girûpên niyabetî li welatên derve xerc kiriye bo vê yekê ku şerê Îsraîl û Amerîkayê bi wan bide kirin, lê piştî 7ê Octobera 2023 a Zayînî ve, tevahiya wan projane bi pûç derkevtin.

Girûpên niyabetî bi sedema êrîşên Îsraîl û bi hevkariya Amerîkayê hatine jinavbirin; Rêjîma Sûriye ya hevpeyman û zordar herifî; Li heyva Cozerdan(June) a îsal de girîngtirîn damezraveyên navkî û mûşekî û fermandeyên herî payebilind ên spaha pasdaaran û pisporên navkiyên rêjîmê, li şerekî 12 roje de kevtine ber êrîşa Îsraîl û ji nav çon; Amerîka jî dawî carê hate nav meydana şer û giringtirîn binkeyên navkî yên rêjîma Îranê bombebaran kirin.

Piştî wan derbên Îsraîl û Amerîkayê, heriftin û şeqbûna binyat û pêgehên rêjîmê û neşiyan û bêçaretiya rêjîmê li berevanîkirin li xwe, hatine dîtin.

Vê rêjîmê li demekê de ku şereke din bo welat û xelkê Îranê çêkiriye ku nekariye biçûktirîn pêngavê bo parastina canê hevwelatiyan bihavêje; bê vê yekê ku qeyranên pêştir ên jiyana xelkê çareser bike, dehan pirsgirêk û qeyranên din li encama wî şerê nû, tûşî xelkê kirine.

Eşkere ye ku şerê vê rêjîmê digel Îsraîl û Amerîkayê û rikeberiyên digel welatên Rojavayî bi dawî nehatiye.

Rêjîm çi çewtekariyên xwe berdewam bike û li ser siyasetên xwe yên heta niha berdewam be, çi teslîm û stuxwarê biryarên Amerîka û Ewropayê be, ji her du aliyan ve kevtiye nav qonaxeke qedersaz li temenê xwe ku encama vê herifîna bi tevavî ya binyatên desthilata vê, rûberûbûn digel xelkê û çona rû bi kendalê nemanê ye.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li ser vê baweriyê ye ku dijberên rêjîma Îranê bi giştî û rêkxiravên siyasî û civaka medenî ya Rojhilatê Kurdistanê bi taybetî, pêwîst e bi yekîtî û amadebûnê ve bi pêşewazîkirina vê qonaxê ve herin.


Li vê navberê de yekkgirtina Hizb û rêkxiravên Rojhilatê Kurdistanê û lihevkirina wan li ser xalên hevpar û destpêkirina hevkarî ya bi piraktîk, bi erkê lezgîn û niha dizain.

Hizba me li ser sîstema komarî, dêmokrat û federal bo Îrana paşerojê ku curbicuriyên netewî, zimanî û olî yên xelkê Îranê û mafên bingehîn ên hevwelatiyan bi fermî nas bike, pêdegiriyê dike.

Bi hizra me, hevkarî û hevahengiya Hizb û rêkxiravên Kurdistanê li çarçoveya hevpeymaniyeke Kurdistanî, hem amiya Kurdistanê li qonaxa herifîna rêjîma Îranê de dabîn dike, hem karlêkeriya erênî bi ser lihevkirinên digel aliyên Îranî dê hebe û pêgeha Kurdistanê li pirsên rewa û ji mêjve yên vê li pêkhate û bername û helwîstên alternatîvî ya vê rêjîmê bilind dike.

**Hogiran, dilsozan, piştevan û dostên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

Li demekê de em bi hilkefta 80 saliya




avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê pîrozbahiyê li we xelkê Dêmokratperwerê Kurdistanê û tevahiya endamên Hizba me dikin ku bi emegnasî û pêzanîna xwe ve jî awir li fîdakarî û xebata têkoşerên Hizba Dêmokrat li serdem û qonaxên cuda didin û li hember tekoşîn û ked û pêbendiya we li asta Hizb û netewa me, bejna xwe ditewînin.

Em dilgerm bi piştevanîkirina xelkê Kurdistanê, hivîdar bi hevxebatiya hêz û aliyên azadîxwazên Kurdistan û Îranê, geşbîn bi pêvajoya bûyer û guherînên pêwendîdar bi Îran û deverê, em dûrdîmena paşeroja xwe bi rohn dibînin û bi hivîyek zaf û baweriyek bi hêz ve, pê dawêjin nava saleke nû û dehikek nû li temenê tekoşîna Hizba tejî şanazî ya Dêmokrat a Kurdistana Îranê.

Rû bi gelên Îranê û opozîsiyona komara Îslamî jî pêdegirî li ser vê dikin ku Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, pêkanîna sîstemeke siyasî ya komarî, dêmokratîk û federal ku têde pirsa netewî li Îranê de hatibe çareserkirin, bi alternatîvek bi wec bo paşeroja wî welatî dibînin; Hevdem em, xwe bi pêbendê pirensîp û binyatên erêkiriyên Hizbê li derheq hewcehiya bi yekîtiyê digel hêzên siyasî yên dijberî rêjîmê dizanin.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Komîteya Navendî**

**Gelawêja 1404 a Rojî**

**Tebaxa 2025 a Zayînî**

# Daxuyaniya bi hilkefta pêkhatina Pêncemîn Plînoma Komîteya Navendî ya Hizba Dêmokrat




Komîteya Navendî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li rojên 25 û 26ê Gelawêja 1404 a Rojî de plînoma pêncem a xwe bi rê ve bir. Plînoma Komîteya Navendî ya hilbijartî ya Kongireya Yekgirtina Dêmokratan ku bi beşdariya endamên eslî û cihgirên Komîteya Navendî bi rê ve ço, rewşa niha ya Îranê û Senaryo û egerên li pêş komara îslamî, rewşa opozîsiyona komara Îslamî û derfet û gefên li ser tevgera Kurd û herwisa çend babetên navxweyî yên Teşkîlata Hizbê, Hilsengandin û biryara hewce bi ser komek ji erk û projeyên Hizbê dan.

Plînoma pêncem a Komîteya Navendî bi bîstek bêdengî bo rêzgirtin ji yad û xebata şehîdên Kurdistanê, dest bi karên xwe kir. Li beşa yekem a karê plînomê de rêzda Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, şiroveyeke siyasî ya hûr û çendîn alî li ser rewşa giştî ya Îranê ya piştî şerê 12 roje digel Îsraîl û rojeva siyasî, aborî û ewlehiya niha ya Îran û Kurdistanê kir û beşdarên plînomê jî bi ra û nêrînên xwe, şiroveya Sekreterê Giştî yê Hizbê dewlementir kirin.

Plînoma Komîteya Navendî li ser vê bawerê bû ku piştî bûyera 7ê October 2023 a Zayînî ve, zêdexwazî û bilinfirînên îdeolojîkî yên Komara Îslamî rastî şikestê hat, şikesta serbazî ya Hemas û Hizbullahê û guherîna siyasî ya rêjîma Sûriyê û lewazbûna milîsên din ên ser bi komara Îslamî wek kûrahiya stratejîk a Îranê, pêgeha rêjîmê li pirsên deverî de rû bi nemanê ve biriye û şikesta serbazî û ewlehî li şerê 12 roje digel Îsraîlê jî zêdetir li her demekê, ev rêjîma heta ser kendalê herifîn û nemanê nêzîktir kiriye. Plînom li vê beşa şirovekirinên xwe de hate ser vê mijarê ku siayseta derve ya komara îslamî ku li ser binyata hinardekirina şoreş li pêxema avakirin a împeratoriya Şîeya siyasî bi serokatiya welîyê feqîh hate avakirin; Zêdetir ji çend trîlyon Dolar ji darayiya welat di cihê diyarîkirin bo beşên, berhemanî, hînkarî, tendirustî, geşe û avedanî ya welat, xercê destêverdan li karûbarên navxweyî yên welatên Rojhilata Navîn, bidestveanîna bombeya navkî, geşedan bi bernameya mûşekî û amadekirina hêzên milîsan li deverê bi heder da û her ew jî bû çavkaniya hemû pirsgirêk û qeyranên aborî, siyasî ên niha li civaka Îranê.

Plînoma Komîteya Navendî li vê beşê de li şirovekirinên xwe de li ser vê bawerê bû ku komara Îslamî li derveyî sînorên Îranê li rikeberiyên deverî û cîhanî de bê hevpeyman û tenêtir û dûrmayîtir li her demekê maye, li başûr de berfirehtirbûna lihevkirina aşîtî ya Îbrahîm li nav welatên deverê digel Amerîka û Îsraîl, armancên stratejîk ên komara îslamî pûç kirin û li bakûrê Îranê jî girêbesta Zengezor bilî bêparkirina Îranê ji dahata milyard Dolarî ta transît û veguhastinê, bûye sedema vê yekê ku pêgeha stratejîk û jeopolîtîkî ya rêjîma Îranê hêj lawaztir bibe û ev Amerîkaya ku bi gotina Xumêynî biryar bû nekare li hember îranê de ti karekê bike tevî firîna balafirên B2 li esmanê Îranê, bibe hevsînorê axa wî welatî jî. Ev yeka bi vê ku linavxweyê welat de jî pengurîna qeyranên aborî, siyasî, civakî û jîngehî, bêmafiya gelan û curbicuriyên netewî û olî û kêmîneya û gendeliya sîstematîk a hikûmî ye, meydana xebat û rawestana xelkê li hember komara îslamî ji her demekê berfirehtir kiriye.

Plînoma Komîteya Navendî li encama basên li vê beşê de hate ser vê bawerê ku gelempera givaş û qeyranên li navxweyê Îranê û hevrikiya vê digel Amerîka û Îsraîl ku niha egera çalakkkirina mikanîzma maşê ji aliyê Troîkaya Ewropayê ve rêjîma Îslamî xistiye ser durêyaneke dijwar û qedersaz: danûstandin û serîçemandin bo mercên Amerîka û Ewropayê û teslîmbûn e, an rastî rewşa şerekî din digel Îsraîl û hevpeymanên din ên îsraîl û vegerîna hemû dorpêçên Şêwreya Ewlehî ye ku ew jî li demekê de ku aborîya niha ya Îranê li rewşeke karesatbar de ye.

Plînoma Komîteya Navendî, piştre hate ser mijara gengeşekirina li ser hejmarek eger û senaryoyan bo paşeroja komara îslamî û hevkêşeyên hêz û deshilat li Îranê û bi hizra vê tevgera Kurd bi giştî û bi taybet Hizba Dêmokrat hewce ye ku xwe bo hemû senariyoyên pêşbênînekirî, amade bike û pêşmercê bidestveanîna her destkevtek siyasî bi qazanca xebata netewî ya gelê Kurd li îranê û dprxistina gefên ser pirsa Kurd, komî serhevkirina nav mala Kurd û vekhevî û hevpeywendiya hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê be. Îşare bi hewcehiya yekgirtin û hevahengiya Hizbên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê û hevkariya bi praktîka wan li xebata siyasî û netewiya Kurd li Îran û paralêl digel hev bo berdewamiya li pêxema çêkirina pireke pêwendî û hevkariya zêdetir digelo hêz û aliyên din ên opzîsiyonên yên ne-Kurd a komara Îslamî ji aliyek û çawatî û çlwaza hewldanan bo girîûngîdana zêdetir bi tevgera netewî, medenî û giştî yên li Kurdistanê û hewcehiya zêdetirkirin a şiyana mikanîzma xwerêkxistinkirin û hevpeywendî û hevxebat,î ya li navbera curbicurî û zafbûnên li civaka Kurdistanê ji aliyê din ve; beşek ji wan pirs û mijaran bûn ku li pilînoma Komîteya Navendî de pêdegirî bi ser hate kirin û li vê derheqê de li ser biryar hate dan.

Plînoma Komîteya Navendî li lêlkdan û şirovekirin ên siyasyên xwe de giringî bi pêşkevtinên pirsa Kurd li beçên din ên Kurdistanê û wasn guherîûnên li Kurdistanê de kir ku bo berjewednî û qazanca pirsa Kurd hatine pêş û li ser vê bawerê ye ku îtirafkirina Tirkiyê bi hebûn a pirsa Kurd li wî welatî û hewldan bo çareserkirin a aşîtîxwazaneya vê pirsê, xweragirî û pêdegiriya xwebirêveberiya Kurdên Rojavayê Kurdistanê bo parastin a destkevtên xebata xwe heta niha ya Kurd li Sûriyê, çêbûna jîngeh û rewşa nû li Îraqê bo çareserkirin a pirsgirêk û dijheviyên li navbera Bexda û Hewlêrê, dikarin bibêjin ku tevgera mafxwazaneya Kurd li hemû beşên Kurdistanê, pêşkevtinên girîng û giringîpêdan bi xwe ve dîtiye.

Beşa bingehîn a din ya karê Plînomê, hilsengandin a Oraganîzasiyona Hizbê û basên navxweyî yên Hizbê bû ku piştî vergirtina ra û nêrîna beşdarbûyên plînomê, pêspartî û biryarên hewce bi ser de hatine dan.

Pêncemîn plînom a Komîteya Navendî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, piştî 2 roj karên bi dom û basên tejî berhem bi serkevtinê ve dawî bi erkên xwe anî.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Komîteya Navendî**

**26ê Gelawêja 1403 a Rojî**

# Hevpeywîn digel rêzdar Elî Şemdîn Endamê Deftera Siyasî (PDPKS) û Nûnerê wê Partiyê li Herêma Kurdistana Îraqê, bi hilkefta 80 saliya damezrandina PDKÎ




**Hevpeywîn: Jêhat**

**Pirsyar 1 - Hûn li parçeyên dinê yên kurdistanê çawa li siyaseta giştî ya (PDKÎ), dinêrin?**

Bersiv - Di destpêkê de, bi boneya (80)'mîn salvegera damezirandina Partiya Demoqrata Kurdistanî Îran (PDKÎ), em bi navê Partiya Demoqrata Pêşverû ya Kurdî li Sûriya (PDPKS), we Pîroz dikin. Birastî (PDKÎ), partiyeke diyar û naskiriye di nav parçeyên kurdistanê yên dinê de ji ber gelek hokaran, yekem: Ev partî kevintirîn partiya kurdiye ku di (1945)'de hatiye damezirandin, diwem: Ev partî damezrênerê komara kurdistan bû ku li Mihabad hatibû ragihandin di sala (1946)'de, û siyem hokar jî ewe ku: Sê rêberên karêzmî û bi nav û deng mîna (pêşewa Qazî Mihemed, Ebdul Rehman Qasimlo û Sadiq Şerefkendî), yek li dûv yek serokatiya vê partiyê kirine, û ew li seranserê kurdistanê bi tevayî naskirîne, ev ji bilî ku vê partiyê xebat û têkoşîna xwe bê rawestan berdewam kiriye di seranserê (80) salî de, û bi hezaran pêşmerge û kadirên wê yên qehreman û mêrxas li ser riya xebatê hatine şehîd kirin û bibê dûdilî canê xwe bexşîne û xwîna xwe rijandine ji bo rizgarkirina milet kurd û bidestxistina mafê wî yên netewî, û vaye îro jî bi hezaran kadirên pêşketî û pêşmergên qehreman bi serokatiya berêz (Mustefa Hicrî), xebata xwe di nav refên vê partiyê de berdewam dikin li dijî zulim û zordariya rêjîma Tehran ya kevneperest û qirêj.

**Pirsyar 2 - Siyaseta (PDKÎ), di derbara xebata kurd li perçên dinê yên kurdistanê çawaye?**

Bersiv - Bi rastî partiya (PDKÎ), pêwendiyeke berfireh heye li gel tevgera siyasî ya kurdî û kurdistanî bi giştî, nexasim li gel partî û aliyên kurdistanî yên ku nûneratiya wan li Herêma Kurdistanê heye, û bi taybet li gel partiya me (Partiya Demoqrata Pêşverû ya Kurdî li Sûriya), ku pêwendiyeke diqolî ya mêjoyî û baş heye di navbera herdû partiyên me yên bira de (PDPKS, PDKÎ), û ji bîst salan ve ez bi xwe jî pêwendiyeke min ya kûr heye li gel partiya (PDKÎ), û ez ji nêzîk ve şahidim ku vê partya têkoşer bi germî piştgîriya xebata tevgera kurdî li hemî parçeyên kurdistanê kiriye û dike, bê ku destê xwe dirêjî nav karûbarê navxweyî yê wan parçeyan bike, û her û her wê rêz li taybetmendiyên parçeyên dinê girtiye û digire, û ev jî ciyê dilxweşiya me ye..

**3 - Pêywendiya (PDKÎ) û partiyên siyasî li perçeyên dinê yê kurdistanê çawa ne?**

Bersiv - Weke ku me di pêşiyê de jî got, pêwendiyên (PDKÎ) li gel partiyên siyasî li perçeyên dinê yên kurdistanê pêwendiyên birayetîne, û ew pêwendî di çarçeweyê rêzgirtin li taybetmendiyên her parçeyekî de ne, û (PDKÎ) her û her piştgîriya xebata tevgera siyasî ya kurdî li parçeyên dinê kurdistan kiriye û dike, û ev helwista rast û dirust ya (PDKÎ), bûye ciyê rêzgirtinê li cem aliyên kurdistanî.

**4 - Pirsa netewî û bandora (PDKÎ) li ser xebata perçeyên dinê yê kurdistanê di çi astî de ye?**

Bersiv - Ne veşartiye ku sînorên (Saykis- Pîko), kurd li herçar parçeyên kurdistan ji hev cuda kirine û durxistine, lê belê hestê netewî di nav miletê kurd de hêşta xurt û bi hêze, û kurd xwe weke yek laşî di nasê, û her beşek jî bandora wî li ser beşeî dinê heye, û di vê çarçewê de (PDKÎ) weke partiyeke kevnar ku (80) sal ji temenê xwe di xebat û têkoşanê de derbas kiriye, û xwedî ezmûneke dîrokî zengîne, û serpereştiye xebata miletê kurd dike li kurdistana îran, bê goman ev xebata pîroz bandoreke erênî bi hêz û karîger dide ser hest û moralê miletê kurd li parçeyên din, û ev bandor erênî gelekî eşkere û diyar bû di vê qonaxa dwî de ku miletê kurd li kurdistana sûriya têre derbas dibû, ji kuştin û wêrankirin û penaberiyê.

**5 - Pêywendiyên dîplomasî yên (PDKÎ), li gel desthilatên wan welatan ku kurdistan bi ser de hatiye parvekirin, çi ziyan û zerer gihandine doza kurd di wan perçeyan de?**

Bersiv - Neveşartiye, ku pêywendiyên dîplomasî yên (PDKÎ), li gel desthilata wan welatên ku kurdistan bi ser wan de hatiye parvekirin, bi şêweyekî serekî girêdayî bû bi sînorên hevbeş dinavbera wan welatan de, lewma bi hokarê sînorên hevbeş yên dirêj di navbera Îran û Îraq de, bêtir bandora îraqê li ser tevgera kurdî li kurdistana Îran hebû, nexasim li ser (PDKÎ), lê bi rastî weke ku agahdarim gelekî bi şarezayî ew pêwendî hatine birêve birin, nexasim di serdema şehîd Qasimlo de ku bi hemahengî li gel bi rehmet bê Mam Celal ew pêwendî dihatin bi rêve birin û bi kêmtirîn zerer û ziyan, lê ew pêwendî li gel Sûriya bi yek carî tunebû, û li gel Turkiya jî di astekî gelekî kêm de bû..

**6 - Ezmûna hevxebatiya we li gel (PDKÎ), çawa basdikin?**

Bersiv - Weke em agahdarin, pêwendiyên dinavbera herdû partiyên me yên bira de, (PDPKS, PDKÎ), vedigere salên heftêyî ji sedsala bîstan, ku wê çaxê her yek ji (YNK, PDKÎ, PDPKS û PSK), û bi çavdêriya herdû partiyên komonîst yên (Îraq, û Sûriya), komîteyek hevbeş hatibû damezirandin ji bo li darxistina kongireyekî kurdistanî, bi tevkariya (Mam Celal, Dr. Qasimlo, Kemal Burqayê û Hemîd Derwîş), û bi amadebûna (Kerîm Ehmed, û Remo Şêxo Ferhe), û vê komîteyê gavên berfireh berbipêşde avêtin lê mixabin piştî destpêka şerê (Îraq, û Îran), ew kar sekinî û bisernekeft. û her ji wê demê de pêwendiyên biratî di navbera herdû partiyên me (PDPKS, PDKÎ)'de, destpêkir û berdewam û xurtir bû ta roja îro, û yê min bi xwe jî ku ji sala (2007)'ve, ez hatim Herêma Kurdistana Îraqê wek nûnerê partiya xwe, pêwendiyeke gerim û berdewam hebû û hêşta jî heye li gel rêberatiya (PDKÎ), û li gel nûneratiya vê partiya bira li (Silêmanî, û Hewlêr), herwiha hemahengiyeke gelekî bi hêz di warê siyasî de heye di navbera nûneratiya herdû partiyên bira de, û di rewşa siyasî ya kurdistanî de helwestên herdû partiyan bi giştî gelekî nêzîkî hevin ..Di vê bîranîna (80) saliya damezirandina (Partiya Demoqrata Kurdistanî Îran)'de, em bi xurtî hêvî dikin ku ev pêwendî wê kûrtir û bi hêztir û xurtir bibin di xizmetê miletê kurd û pirsa wî ya rewa de..

**Silêmanî, Tebaxa 2025 an a Zayînî**

# Peyama rêzdar Mistefa Hicrî bi hilkefta belavbûna 500emîn hejmara “Agirî” û 900emîn hejmara “Kurdistan”


Hevpeywîn digel rêzdar Elî Şemdîn
Heval û hevkarên hêja li malbata Agirî
Agirî
Peyvên ji bo Agirî
JI ÇIYAYÊ AGIRÎ VE BO ROJNAMEYA AGIRÎ
Agirî sembola xwendin û berxwedanê
Peyama“Mistefa Hicrî” Sekirtêr Giştî yê Hizba Dêmokrat
کوردستان

**Rêzdar “Mistefa Hicrî” Sekirtêr Giştî yê Hizba Dêmokrat, bi hilkefta derçuna 500 e mîn hejmara Agirî û 900e mîn hejmara “Kurdistan”, peyamek belav kir.**

Deqa peyamê wiha ye:

Weşana 900e mîn hejmara rojnameya “Kurdistan” zimanhalê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, hevdem digel belavbûna 500e mîn hejmara rojnameya “Agirî”, wek belavokek siyasî-çandî ya Organa Ragihandin a vê hizbê ye.

Man û pêşxistin û berdewamiya wan herduk rojnameyan, ku zimanhalê Hizba Dêmokrat û tevgera Netewî-Dêmokratîk a Rojhilatê Kurdistanê ne, encama xebat û lêzanîn û cehdên newestane ên çendîn nivşan ên xebatkarên Dêmokrat û hogirên pirsa netewiya Kurdistanê li bajar û çiya de bûye.

Bi vê hilkeftê, tevî pîrozbahîkirin li birêveber û hevkarên wan 2 rojnameyan, mandînebûniyê li tev wan kesan dikim ku bi cehd û xebata bêrawestana xwe, li demên herî dijware şoreşê de, çi li derve û dûr ji welat û çi li navxweya welat de berdewambûna wan 2 organan li stuyên wan bûye û karûbarên nivîsîn, pêdeçon û aliyê teknîkî, li ser milê wan bûye.

Ev berdewambûna, nîşanderê girîngiya karê ragihandinê li ser bingeha doza Kurdistan û Kurd e ku Hizba Dêmokrat bi giringî û bihayek bilind ve mêzeyê vê dike wek wêzgeheke ji xebata xwe, li ser berdewam e.

**Mistefa Hicrî**
**Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**17ê Gelawêj a 1404 a Rojî**
**8ê Tebaxa 2025 a Zayînî**

# Peyvên ji bo Agirî



N. Mihemedsalih Qadirî

Bi hilkefta 500`mîn hejmara rojnameya Agirî, bi dilgermî û serbilindiyek mezin ve pîrozbahiyek germ ji hemû xebatkar û xwendevan û welatperwerên Kurdistanê dikim.

Bo min wekî damezrêner û rêvebrê qonaxa yekem a Agirî, çi hesteke xweş û rûmetek mezin e ku bêjim îro ne tenê bîranîna 500`mîn a rojnameya Agirî ye, belkî di heman demê de bîranîna rêwîtiyek dirêj û maratonek 22 salî ye ku ji dema damezirandina Agirî de, em wekî wan zarokên ku ji çalepîtiyê ve dest pê bikin wisa bûn, lê niha em gihane serdema xortiniya 22 salî ya Agirî.

Bê guman Agirî ji niha şûnda jî biqavet û baştir dê ked û xebata xwe ya pîroz bidomîne.

Çima navê rojnamê bû Agirî? Felsefeya danîna navê Agirî ji bo rojnameya me û weşandina wê bi tîpên latînî û zaravayê kurmancî, di sergotara yekem hejmara Agirî de bi manşeta ji Çiyayê Agirî ve ber bi rojnameya Agirî hatiye.

Ev nav hem îlhamwergirtin bû ji navê rojnameya Agirî ya serdema serhildana Agirî/Araratê, hem jî li ser bingeha wê armanca ku Agirî jê re hatibû damezrandin, ku wekî Çiyayê Agirî bibe sîvana pêkvegirêdana Rojhelatê Kurdistanê û Bakûrê Kurdistanê û Kurdên Qefqasiyayê, û bibe pira gehandina deng û rengê xebata rizgarîxweziya Rojhelatê Kurdistanê ji bo Bakûr û Rojava û Kurdên diyasporayê, û bikaribe dengûbas û rewşa siyasî ya tevgera Rojhelatê Kurdistanê bi tîpên latînî û zaravayê Kurmancî bigehîne welatperwerên me.

Rojnameya Agirî bo me dibistanek e ku tê de zanyariyên rast û hişmendiya netewî û rihê welatheziyê hatiye belavkirin.

Di debistana Agirî de, li ser wê xebata ku tê de dengê rastî û hizra azad a welatperwerî û hişmendiya netewî tê



afirandin, em bilind dinirxînin.

Spas ji bo rewşenbîr, helbestvan û nivîskarên me re ku bi pênûsa xwe ya zêrîn Agirî kirin platformeke afirênerî ya zanyariyên giranbuha, û heta îro jî bi Agirî re berdewam in.

Spas ji bo xwîner û rexnegirên dilsoz û kedkarên fedakar, ku di vê rêwîtiyê de bê westiyan kar kirine û em gihandine roja îro.

Agirî di wan 22 salan de gelek xebat kiriye da ku ne tenê wekî rojnameyeke hizbî û berteng, belkî wekî platformek azad, nêrîn û ramanên cuda jî belav bike û di dilê gelê xwe de hêviyeke birûmet biçîne, û bi parvekirina zanyariyên siyasî û pêşxistina hişmendiya netewî, bandorek berçav li ser coxîna rojnamevaniya kurdî hebe û şopa xwe kifş bike.

Di daviyê de hêvîdar im munasibeta 500`mîn hejmara Agirî bibe despêka qonaxeke nû û dewlemend ji bo kar û xebatên zêdetir ên rojnameya Agirî û xebatkarên wê yên hêja.

## Nerîna



“Xalid Ezîzî”:

“Partiya Demokrat di qonaxa niha de berpirsiyarê biryarên kongreya xwe ya dawî ye, û ev nayê wê wateyê ku xelkê Kurdistanê dirûşm û daxwazên din nînin, û em van daxwazan bi tevahî normal dibînin”



“Rostem Cehangîrî” :

““Dr. Qasimlo” Hizb ji belavbûn û bêserûberiyê û bêbernametiyê rizgar kir û kire hizbek ediyê “bernameyek pêşkevtî û modern”



“Mihemed Salih Qadirî ”:

“Damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistanê li ser bingeha Komeleya J.K.F Kurdistanê di ber bi dawiya Şerê Cîhanê yê Duyemîn de xaleke werçerx ya dîrokî û gaveke pragmatîk bû ku ji aliyê Pêşewa Qazî Mihemed û hevlên wî ve hat avakirin”



“Viladymyr Zelenskyy”:

“Em ji bo agirbesteke rastîn amade ne”

# Agirî 500 hejmar ji bo haydarkirina raya giştî û berxwedanê



N. Eskender Ceiferî
– Endamê Desteya Agirî




Hejmara pêncsedemîn a rojnameya Agirî ne tenê bûyerek medyayî ye, ew di heman demê de beşek ji dîroka hevçerx a têkoşîn û berxwedana Kurdistanê ye. Agirî, ku wekî yekem û berdewamtirîn rojnameya Kurmancî li rojhilatê Kurdistanê tê hesibandin, ji destpêka xwe ve ne tenê amûrek agahdariyê bûye, lê di heman demê de di rêya têkoşîna gelê Kurd a ji bo azadiyê de alîkar û handerek çandî û siyasî jî bûye.

Agirî dezgehek medyayî ye ku di dilê têkoşîna dijî-kolonyalîzmê de ye. Wekî organa fermî ya Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê, ev rojnameya jî li kêlega rojnameya Kurdistan, ji destpêkê ve erkek zelal û giran hilgirtiye ser milên xwe. Ew jî ji bilî erkên wê yên medyayî ne. Xebata wê, nîşandana dengê neteweyekê ye ku bi dehan salan di bin givaşa polîtîkayên înkar û tepeserkirinê de ye. Her hejmarek Agirî hewldanek e ji bo şikandina dîwarê sansurê, gihandina rastiyê bo ber guhê gel re, û xurtkirina ruhê berxwedanê li dijî kolonyalîzma Îranê. Pêncsed hejmar tê wateya pêncsed gavan li ser rêbaza hişyarî û têkoşîna ji bo azadiya Kurdistanê.

Bandora rojnameya Agirî li ser civaka Kurmancî nayê înkarkirin. Ji Urmiye û Xoyê bigire heya Mako û Selmasê, û heya li Xurasana dûr jî, Agirî bûye medyayek mayînde. Vê rojnameyê ne tenê nûçe û analîzên siyasî weşandine, lê di heman demê de nasnameya çandî û zimanî ya Kurdan jî xurt kiriye. Li deverên ku tîpa latînî ya Kurdî kêm dihat naskirin, Agirî bûye pirtûkxaneyek zindî ji bo hînkirin û pêşvebirina vê tîpê. Gelek kes ji nifşê ciwan ezmûna xwe ya yekem a xwendin û nivîsandinê bi zimanê xwe yê dayikê di nav rûpelên vê rojnameyê de dest pê kirine.

Di salên dawiyê de, Agirî karî dab û nerîta rojnameya çapkirî û têknolojiyê li Kurdistanê li hev girê bide. Yek ji taybetmendiyên herî berbiçav ên Agirî ew e ku ew dikare bi pêşketinên serdema dîgîtal re bimeşe. Ger di demên berê de çapa wê bi dijwarî û bi awayekî veşartî li Kurdistanê dihat belavkirin, îro her hejmareke wê bi hezaran caran bi formata PDF tê dabezandin. Ev jî nîşan dide ku Agirî kariye sînorên erdnîgarî û astengiyên sansurê yên dagirkariya Tehranê derbas bike û bigihîje Kurdan li her deverê ku ew lê dijîn.

Lêbelê, berpirsiyariya pêşeroja Agirîyê dijwar e. Gihiştina hejmara 500 mîn ne dawiya rê ye; destpêkek nû ye. Agirî îro ji her demê bêtir erkê wê ye ku bibe dengê bêdengan, bîra pêşerojê ya gel tomar bike û rastiya dîroka xwe ya dijî kolonyalîzmê ji bo nifşên pêşerojê bide nasîn. Berdewamiya wê tê wateya berdewamiya berxwedanê û parastina ziman, çand û ramana azadiyê.

Agirî ne tenê rojnameyek e, ew vegotina dîroka têkoşîna neteweyekê ye ku tevî hemû qedexetî û givaşan jî, dengê xwe bêdeng nekir. Hejmara wê ya 500 mîn nîşan dide ku têkoşîna dijî-kolonyalîstî ya Kurdan ne tenê li çiya û li qada siyasî, lê di heman demê de li ser rûpelên rojnameyê jî berdewam dikin. Pêşeroja Agirîyê pêşeroja domandina zimanê Kurdî û berdewamiya rêya azadiyê ye.

# Rêzdar Têmûrê Xelîl nivîskar û rewşenbîr û lêkoler Kurd ji Êrevanê bi hilkefta weşana 500 mîn hejmara Rojnameya Agirî, peyamek ji bo Agirî şandiye



Têmûrê Xelîl

**Deqa peyama rêzdar Têmûrê Xelîl bo Agirî wiha ye:**

Îro cejina Rojnama Agirî ye 500 hejmar derketine, ez ji we bi dil û can pîroz dikim, gelek keyfxweş im ku keda min jî di vê govarê de heye, min berê çend gotar ji Agirî re nivîsîne, navê Agirî ji bo me gelek pîroz e, wisa bûye ku gelek perçeyên welatê me ji çiyayê Agirî pirr nêzîkin weke Kurdistana Rojhilatê, Kurdistana Bakûr û ji Ermenistanê jî gelek nêzîk e, tê bîra min ku me li gundekî Ermenistanê ji defê dixist ji aliyê din Kurdên me li Bakûr govend digirtin.

Eva tiştek sîmbolîk e hêza çiyayê Agirî gelek xorte û em hêvîdarin ku ev hêz her çar parçeyên welatê me bigehîne hev, û rojekê ev sînor bêne rakirin, emê govenda here mezin li welatê xwe yê yekgirtî de bigirin.

Navê çiyayê Agirî pirr pîroz e bo min, û gelek navê wê hene weke Agirî, Îgirdax, Ararat lê Ermenî jê re dibêjin Çiyayê Masîs, lê çava be ev di rihê Kurdistanê deye û em hêvîdarin ku ev hêzek pir mezim bide me hemû Kurdan ku em yekgirtî li welatê xwe de govendek serxwebûnê bigirin.

# Ji rêvebirîya rêzdar ya Rojnameya Agirî re



Muştafa Ozçelîk

Di 20ê meha tebaxê de, Rojnameya Agirî dê hejmara xwe ya 500ê biweşîne.

500 hejmarên Rojnameya Agirî, di meşa rojnamgerîya kurdî de, di warê azadîya ramanî û ragehandinê de û di lêxwedîderketin, geş kirin û xurt kirina bîr û bawerî û hestên welatperwerîyê de; nişan û berhema ked, îstîkrar, berdewamî, biryardarî, dilsozî, bîrewerî, fedakarî, netewperwerî û niştimanperwerîyê ye.

Di dîroka rojnamegerîya kurdî de, 500 hejmar, karekî pîroz e, bi qîmet e, serbilîndî û serkeftin e, ji bo her kurdperwerekî cîhê dilxweşîyê ye.

Rojnameya Agirî, rûmet daye min û nivîsên min jî belav dike. Ev ji bo min cîhê rûmet û kêfxweşî û serbilindîyê ye. Ez spasîya rêvebir û xebatkarên Rojnameya Agirî yê dikim. Herweha Rojnameya Agirî, daxuyanîyên partîya me jî belav dike. Ev nişana dostanîya me ya ji dil e. Ez ji bo vê yekê jî bi taybetî spasîya xuşk û biryarên xwe yên ku kedkarên Rojnameya Agirî yê ne dikim.

Rojnameya Agirî, di agahdarîya nûçeyan û di hûnandina raman û sîyaseta kurdistanî de, roleke dîrokî û girîng dilîhîze.

Girîngî, dewlemendî û taybetmendîyeke din ya Rojnameya Agirî yê ewe ku hem bi alfabeya erebî û hem jî bi ya latînî weşanê dike. Rojnameya Agirî, bi taybetî wek kurdên Bakurê Kurdistanê, ji bo me paceyeke, şibakeke girîng e ku em bikaribin ji rewş, bûyer, xebat, têkoşîn, siyaset, kultur û ramanên xuşk û biryarên xwe yên Rojhilatê Kurdistanê agahdar bin.

Ez ji bo ked û xebata wan a giranbûha hemû rêvbir, xebatkar, nûçegîhan, nivîskar û piştgirên Rojnameya Agirî yê, hemû rêvebir û endamên Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê (PDK-Î) pîroz dikim, her serkeftinê ji wan re dixwazim.

Bi hêvîya ku Rojnameya Agirî bi hezaran hêjmar weşana xwe bidomîne; bi hêvîya ku di Kurdistana azad de, Rojnameya Agirî weke rojnameyeke rojane bigihêje bi milyonan mirovan.


Li gel rêz û silavên xwe.

**Mustafa Ozçelîk**

**Serokê Giştî yê Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK)**

# Peyama rewşenbîr û nivîskarê Kurd rêzdar Konê Reş, bi hilkefta weşana 500 mîn hejmara Rojnameya Agirî




Wek nivîskarek û wek Kurdek welatperwer ku guhdana min bi dîreok û rewşenbîriya Kurdî heye, û ez û kesên di cîlê min de em li ser navê Qazî Mihemed û Berzaniyê nemir mezin bûne, ez bi derçûna 500 hejmarên rojnameya Agirî dilxweş im, û ez derçûna 500 mîn hejmara vê rojnamê ji gelê Kurd, rewşenbîrên Kurd û siyasetmedarên Kurd pîroz dikim, bi rastî dema ku min sehi kir rojname navê wê Agirî ye, General "Êhsan Nûrî paşa" û serhildana Agirî hat bîra min, eşîra Celaliya û eşîra Hesinan ku di vê serhildanê de bûn hatin bîra min, û ez ketim nav pêlên şoreş û serhildanên Kurdên Rojava û Rojhelatê Kurdistanê, Komara Mehabad, Simko axayê şikak û Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, û di nava rûpelên wê de ez serwextê kuştina Pêşewa Qazî Mihemed, Seyf û Sedirê Qazî, û kuştina Qasimlo û Şerefkendî bûm, û berxwedana Kurdên me li Rojhilatê Kurdistanê ez bûm, û di nava rûpelên wê de bêtir ez serwextî bidarvekirina xurtên Kurd yên ku ji ber azadî û serxwebûna Kurdistanê xebatê dikin û bi destê rejîma faşîst yê Îranê tên darvekirin.

Ez jî weke Kurdek û wek nivîskarek Kurd li Rojavayê Kurdistanê min gelek caran di nav rûpelên vê rojnameya Agirî de berhemên xwe belavkirine bi keyfxweşî ve, nexasma ku ev rojname bi elfûbêya Mîr Celadetê Bedirxan elfûbêya Latînî tê çap û belavkirin, ku Mîr Celadetê Bedirxan bavê elfûbêya Kurdiya Latîn e ku sed sal beriya niha di Şama şerîf ew elfûbê berhevkiriye ji bo zimanê Kurdî, bêtir jî ev elfûbê dêfêntîkên zimanê Kurdî li xwe kiriye, bi hêvî me bi derçûna 500mîn hejmara rojnameya Agirî di rojên bê de ez vê rojnamê li pirtûkxaneyên Qamîşlo, Amed, Hewlêr û tev bajarên Kurdistanê bibînim, û bêtir nivîskarên vê rojnamê berhemên xwe yên cidî di vê rojnameyê de biweşînin.

# Heval û hevkarên hêja li ‘’Agirî’’yê



N. Selîm Zencîrî

Niha ku dibînim karwanê xebat û tekoşîna ‘’Agirî’’yê bênavber berdewam dike û gihaye hejmara 500 a xwe, dixwazim ji dil û can vê deskefta mezin û buhagiran ji we û hemû xwendevan û şopînerên Agirî pîroz bikim. Bêguman pêncsed ne tenê hejmarek, belkî nîşana hewildanên dûr û dirêj û bênavber e di pêxem şopandina heqîqetê, hişyarkirina civakê û geşedana pênûs û hizrên ku li hember asmîlasiyona zimanî, çandî û netewî de bûne çeper û qelxanek polayîn.

Her rûpel ji van hejmaran, hilgirê dehan çîrok û destanrêsiyan e ji şeqîtî, strês, hedarî û tekoşîna we û xebatkarên ku di her rawestegeh ji tekoşîna Agirî de, xwedî bandor bûn û nehiştin şemendefira pêşdeçûna Agiriyê ji liv û herikînê bisekine. Agirî berhema eşq û evîna bi kar û berpirsatiyekê ye ku we hildaye ser milê xwe. Agirî ne tenê kar û erkê nûçe û nivîs û xemlandina rûpelan, belkî hilgirê erk û resaletek dîrokî û netewî ye ku bi derbaskirina tixûban û avakirina pirên pêwendiyê bû bi balyozê heqîqet û rastbêjiya gel û wekî mom û şemalkek teyîsî di tarîtiya zulm, bêdadî û bêbextiyê de, ronahî da çarmedorên xwe.

Agirî ku îro serbilind, şanaz û li ser piyan e, berhema rol, cehd, tekoşîn, emegnasî û nirxdayîna dehan rojnamevan, rewşenbîr û nivîskarên kurd e ku li pişt her hizir, peyv, hevok, nivîs û xemlek Agiriyê, hêz, moral, îrade û ked û zehmeta wan heye ku îro bûne sermiyanek mezin a netewî; lewma ew ne tenê xwediyê vê serkevtinê, belkî hêjayî medalyaya şeref, şanazî û emegnasiyê ne.

Bêguman gehîştina bi vê hejmarê ne hêsan e, lê dawiya maratonê jî nine, hêj zaf peyv û hedîsên manadar û bedev mane ku li benda gotinê ne. Lewma bila her hejmarek nû; mosîqayek be ji bo lêdana dilê welat, neynûnek be ji bo xwedîtin û nîşandana kul û kovanên gel û xemla welat, kevirek be li ser dîwarê



xizmet bi çand, ziman û wêjeya kurdî, merhemek be bo hesreta dilê dayîkan û hêsirê çavê wan, û rihek taze bide ber xwendevan û şopîneran.

**Hevalên birûmet!**

Bo min şerefmendî û şanaziyek mezin e ku endamê desteya avaker û sernivîskarê Agirî di qonaxek girîng û hesas ji tekoşîna vê rojnameyê de bûm û îrorojê ku hûn mîratgirê vê sermiyana binirx û berpirsatiya giran in, xatircem im ku emanetdarên hêja û baş in di parastina vê qutabxaneya hizrî û çandî ku li ser şopa heqîqetê û rêbaza xizmetê ava bûye.

Tevî pîrozbahiya dubare, we tevan bi rêzdarî silav dikim û destên we ku hizr, pênûs, evîn û xebat li hev alandine û pêwenda wan hertimî kirine, bi germî digivişim û hêviya berdewamî, geşe û serketinê bo we û Agiriyê dixwazim.

**Selîm Zencîrî, endamê Desteya Avaker û Sernivîskarê berê yê Agirî**

# Agirî sembola xwendin û berxwedanê



N. Şehab Xalidî

Kêfxweş im ku bi vê nivîsa kurt hejmara 500î ya Agirî pîroz dikim. Kêfxweş im ku Agirî karî bi hewl û tekoşîn û ked û mandîbûna hevalên dilsoj bi ser hemû astengiyan de serkeftinê bi dest bixe û bibe kelemê çavê neyar û nehezan.

Bêguman Agirî di rewşekê de hate avakirin, ku serbarê nebûna îmkanatên madî û teknîkî, û nebûna şarezî û pisporiyê di karê rojnamevaniyê de, hevalên dilsoj û xemxor zendê xwe hildan, û bi dil û can û bi evîneke efsûnawî wekî evîna Mem û Zînê xebitîn bona ku hejmara yekem ya Agirî wekî mizgîniyekê bidin hemû wan dost û hevalên ku li benda derketina tîrêjên wê roja bedew û ronahî bûn.

Wê rojnameyê gelek zû karî di nav dilê evîndarên xwe de hêlûneke ebedî ji xwe re çêke, û bibe çavkaniya zanyariyên rast û şiroveyên bihêz û dewlemend. Ji hemiyê girîngtir karî ku bibe pirek di navbera Rojhilatê Kurdistanê û parçeyên din ên Kurdistanê bi Kurdên Qefqaziyayê ve jî, ku berî derketina Agirî zanyariyên wan li ser PDKÎ û Rojhilatê Kurdistanê yan tunebûn an jî kêm bûn.

Herwiha bi bikarhînana zimanekî zelal û di heman demê de rast û dirust di warê rênivîs û rêzimanê de karî bibe xwendingehek ji bo hemû hezkiriyên alfabeya latînî.

Dema ku ez carina li hejmarên berê yên Agirî dinêrim, rûpel bi rûpelên wê min dibin nav xeyalên kûr de, xeyalên ku di nav bîreweriyên tal û şirîn de asê dimînin. Darêtina nûçe û raporên tal ên girêdayî qedera xak û neteweya me em xembar dikirin, û berevajî



wê yekê jî em kêfxweş dikirin.

Belê Agirî êdî bi tenê rojnameyek nebû, belku bûbû zarokeke malbatê, ku mirov tenê û tenê li benda serkeftina wê bû, û niha jî herwisa.

Niha ku Agirî moma xwe ya 500î pêdixe, ez daxwaza temendirêjiyê jê re dikim, û hêvî dikim roj bi rojê bazineya kar û xebata xwe berfirehtir bike û li gor teknîka modern a îrorojê here pêş, û bibe çavkanî bo hemû wan kesên ku dixwazin hem zanyariyan jê wergirin û hem jî wekî xwendingehekê jê fêr bin.

Di dawiyê de hêviya silametî û temendirêjiyê bo hemû wan kesan dixwazim ku ji bo berdewamiya Agirî ked dane û niha jî kedê didin.

**Şehab Xalidî, Berpirs û sernivîskarê berê yê Rojnameya Agirî**

# 500 gavên ber bi ronahiyê



Dr. Mecîd Heqî




Pêncsed hejmar, pêncsed gav li ser rêya hişyarî, nasname û hevgirtinê. Îro, weşana Agirî gihîştiye xalekê ku ne tenê dikare wekî destkeftiyek medyayê were hesibandin, lê divê ew wekî belgeyek zindî ya domdariya çandî, berxwedana nasnameyê û hewldana avakirina neteweyê di çarçoveya dîroka hemdem a Kurdistanê de jî were analîz kirin.

Ev weşan, ku hejmara wê ya yekem di havîna 2001-an de hate weşandin, ji rewşek derket ku çavkanî kêm bûn, lê motîvasyon û pabendbûna nifşê ciwan ê Kurd bêdawî bû.

Di wan salan de, min jî şanaziya wê yekê hebû, ku bingeha jidayikbûna vê kovarê, digel komek ciwanên welatperwer û şoreşger, bi dayîna çend kursên kurt di warê rojnamegerî û weşangeriya elektronîkî de peyda bikim. Ji destpêkê ve, Agirî rêwîtiya xwe bi hewildanên dilxwaz û evîna çand û zimanê Kurdî dest pê kir. Ev weşan ne ji saziyên fermî, lê ji dilê mirovan derket; Ji hewcedariya dengek serbixwe, agahdar û girêdanê.

Di rewşekê de ku medyaya fermiye cîhanê gelek caran rastiyên jiyana Kurdan nîşan nedide an jî paşguh dikir, Agirî karîbû wekî dengekî alternatîf vê valatiyê tijî bike. Bi wêrekî û rastgoyî, weşanê çîrokên ku di medyaya sereke de cihê wan tune bû weşand: çîrokên têkoşîn, hêvî, çand û jiyana rojane ya mirovên ku li beramberî civakê hatibûn hiştin.

Di wêjeya zanistên civakî de, medya ne tenê amûrên agahdarkirinê ne. Ew platformên ji bo hilberandina nasnameya kolektîf, xurtkirina hevgirtina neteweyî û heta avakirina neteweyê ne. Di berhema xwe ya klasîk "Civakên Xeyalî" de, Benedict Anderson nîşan dide ka çapemenî çawa dikare neteweyên ku endamên wan qet hevdu nedîtine lê hestek çarenûsa hevpar parve dikin biafirîne.

Agrî tam ev rêye şopand: avakirina civatek xeyalî ya Kurd, ji Urmiyê heta Xorasanê, ji Qamîşlo heta Yêrêvanê, ji sirgûnê heta dîyasporayê. Agrî ne tenê karîbû bibe alîkar ku ziman were parastin, lê di heman demê de wê veguherîne amûrek ji bo bilindkirina hişmendiyê û xurtkirina nasnameya neteweyî. Di her hejmarê de, weşanê hewl da ku wêje, helbest, dîrok û vegotinên netewî nîşan bide, bi vî rengî gotarek neteweyî û çandî ava bike ku hem di kevneşopiyê de kok girtiye û hem jî li pêşerojê dinêre.

Di van 22 salan de, Agirî karîbû di navbera beşên belavbûyî yên civaka Kurd de girêdanan deyne. Weşanê dengê gelê Kurd ji Urmiyê heta Xorasanê, ji Kurdistanê heta Ewropa û Kurdên rûniştiwane Sovyeta berê anî. Di çarçoveya teoriyên dîyasporayê û neteweya transneteweyî de, Agirî bû platformek ji bo afirandina toreke hevgirtinê li derveyî sînorên erdnîgarî.

Ev girêdan ne tenê çandî bûn, lê di heman demê de siyasî û civakî bûn; girêdanên ku hêviya ji bo pêşerojek hevpar zindî dihiştin.

Di vê wateyê de, Agirî rolek dişibihe rojnameyên şoreşên Ewropî yên sedsala nozdehan, ku çapemenî amûra sereke ya avakirina wijdana neteweyî û rêxistina civakî bû.

Agirî her wiha karîbû platformek peyda bike ku tê de gelê Kurd ne tenê dikare ji nûçe û analîzan sûd werbigire, lê di heman demê de xwe wekî beşek ji projeyek mezintir hîs bike: projeyek ji bo ji nû ve avakirina nasname, çand û pêşerojê.

Agrî ne tenê dezgeheke medyayê ye; ew dibistanek e ji bo hînkirina rojnamegerî, analîza siyasî û nivîsandina agahdar. Gelek ji nivîskar û kadroyên çandî yên îroyîn gavên xwe yên pêşîn di vê weşanê de avêtin. Ev pêvajo, li gorî modela "Ragihandin ji bo Pêşveçûnê", alîkarî da ku kapasîteyên navxweyî yên civaka Kurd xurt bibin û sermayeya mirovî ya hêja pêş xist ku îro di warên çandî, civakî û siyasî yên cûrbecûr de rolek dilîze.

Ev perwerdehiya kadroyan ne tenê di asta teknîkî û pîşeyî de, lê di heman demê de di asta exlaqî û rewşenbîrî de jî pêk hat. Agrî karibû hawîrdorek peyda bike ku tê de nivîskarên ciwan dikarin bi prensîbên rojnamegeriya azad, berpirsiyar û pabend bibin nas. Ev di rewşek de ku medyaya fermî pir caran bi sansûr û sînorkirinên giran re rû bi rû maye, destkeftiyek mezin e.

Îro, rojnamegerî diguhere. Teknolojiyên nû yên wekî zekaya sûnî, rojnamegeriya li ser bingeha daneyan, medyaya civakî û weşana multimedia ji bo medyayê asoyên nû vekirine.

Ger Agirî van amûran bixe xizmeta armancên xwe yên çandî û neteweyî, ew dikare ji weşanek kevneşopî veguhere dezgehek medyaya înteraktîf, multimedia û gerdûnî. Di serdema dîjîtal de, temaşevan êdî ne tenê xwendevan in; ew beşdar, hilberîner û heta rexnegir in.

Agirî divê bikaribe bi vê temaşevanên nû re diyalogek dualî bike; diyalogek ku tê de naverok ne tenê tê veguheztin, lê di heman demê de ji nû ve tê afirandin. Ev veguherîn hewce dike ku avahî, ziman û rêbazên hilberîna naverokê ji nû ve were fikirîn; lê heke bi rêkûpêk were kirin, ew dikare Agirî veguherîne yek ji weşanên Kurdî yên herî navdar li herêm û cîhanê.

Çawa ku Çiyayê Agirî li ser erdnîgariya Kurdistanê bilind radiweste, weşana Agirî di warê çandî yê neteweya me de sembola aramiyê, hêviyê û pêşveçûnan e. Pêncsed hejmar ne tenê hejmarek e; ew çîrokeke berxwedana li dijî jibîrkirinê, berxwedana li dijî bêdengiyê û evîna ziman, çand û mirovan e.

Vê weşanê nîşan da ku heta di şert û mercên herî dijwar de jî, mirov dikare binivîse, mirov dikare bifikire û mirov dikare bi hev re têkilî dayne. Agirî dengvedana neteweyekê ye; dengvedanek ku ji çiyayan, ji dilê êş û hêviyê derketiye, û îro, di hejmara xwe ya 500emîn de, ew hîn jî zindî, dînamîk û îlhambexş e.

Niha ku em gihîştine vê xala dîrokî, dem hatiye ku em rêzê li rabirdûyê bigirin û pêşerojê ji nû ve biafirînin. Pêşerojek ku tê de Agirî dikare bi karanîna teknolojiyên nû qada bandora xwe berfireh bike; Wergerandî zimanên din, veguherî podcast û vîdyoyan, û di dilê torên civakî de, dengek nû ji bo nifşên ciwan.

Divê Agirî bikaribe bibe medyayek ku ne tenê çand û siyasetê nîşan bide, lê di heman demê de wate, vegotin û hêviyê jî hildiberîne. Ev rê dijwar e lê gengaz e; û heke bi heman motîvasyona destpêkê, bi heman evîna ji bo mirov û çandê berdewam bike, bê guman dê serketî be.

Pêncsed hejmarên Agirî ne dîroka kovarekê ne; ew dîroka neteweyekê ne. Neteweyek ku nivîsand, xwend, fikirî û pêwendî danî. Bi hêviya ku Agirî wekî stêrkek di ezmanê rojnamegeriya Kurdî de bibiriqe û rê ji bo nifşên pêşerojê geştir bike.

# Agirî, Pirek di navbera siyaset û civakê de Bi hêcete weşandina 500 hejmara ”Agirî”



N. Serbest Urmiye
Endamê desteya Agirî

Rojnameya ”Agirî” ku niha 500’mîn hejmara xwe diweşîne, nabe tenê weke destkeweke rojnamevaniyê were mêzekirin, Belkû hêmaya berxwedan û domdirêjiya medyayekê ye ku kariye di panahiya welateke ji hev veqetiyayî de, hevdem ku di çepera parstina nasname û dîroka neteweyekê de berxwe bide, bibe dengê mafxwaziya gelê Kurd jî.

Di weşanên xwe yên heta niha de, ”Agirî” daye xuyakirin ku siyaset ne tenê bo qada leşker û şer e û nejî qumaşek e ku tenê di bazara partiyên siyasî de were kirîn û firotin.

Belkû di bingeha hizira mediyayî ya rojnameya Agirî de, siyaset hewcehiya civaka mirovahiyê ye, ji bo ku bikare di her alî de were perwerde û geşe kirin.

Xebata Agirî, di warên hêma û sembolên neteweyî de, nete ne vexwendina dîrokê ne, belkû danenasîn û zindî ragirtina nav û xebatên rêber û tekoşerên Kurd, kiriye hêceteke pir biha ji bo ku hebûn û nasnameya siyasî, neteweyî û ... ya gelê Kurd bi rojeva cîhanî re girê bide û bike parzûneke dewlemend bo berxwedana nifşa nû.

Bi salan e ku ”Agirî” weke pirekê ji bo bi hevregirêdana nifşa bijarte, civaka sivîl û welatiyên asayî berxwe daye û dide .

Danezanîn û şirovekirina arîşeyên rojeva Kurdistan, Îran û herême, ”Agirî” kirine zimanê hevpar ji bo daxuyanî û niqaşan di warên siyaset, netewexwazî, çandî û civakî de bo nifşa nû û tev aliyên din yên civakê.

Taybetmendiyeke din ku rola ”Agirî” 



Demokrasî bo Îranê
Hejmar: 1 Novembera 2003

agirî

Otonomî bo Kurdistanê
Sermaweza 1382’e Rojî

Rojnameyeke siyasî û çandî ye

Partiya Demokrata Kurdistana Îranê diweşîne

**Ji çiyayê Agirî ve ber bi Rojnameya Agirî**

Bi xweşî ve bi agehdariya hemû alîyekê digehînin ku Partiya Demokrata Kurdistana Îranê ji ber dest daye ku rojnameyeke mehane ya siyasî, çandî bi navê Agirî û bi zaraveya Kurmancî ya jorîn û bi tîpên latînî biweşîne.

Merema Partiya Demokrat ji vê biryarê, ji aliyekê nasandina her çi qas zaftire bizava rizgarîxwaze gelê Kurd û PDK Îranê bi vê para xelkê Kurdistanê ku bi zaraveya Kurmancî ya jorîn dipeyv in û xwendin û nivîsandina wan bi tîpên latînî ye. Ji aliyek din û di çarçoveya siyaseta çandî ye xwe de bo pûte û giringîdan bi pêşveçûna ziman û çanda Kurdî û pêşvebirina astê rewşenbîriya vê parê ji xelkê Kurdistanê,

**Birêz Ebdula Hesenzade, Sekreterê Giştiyê PDK Îranê di hevpeyvîneke tevî Agirî de**

Xwendevanên hêja, Ev hevpeyvîna jêrîn bi şane bûn û kêfxweşiya weşana yekem hejmara Agirî ji aliyê desteya nivîskarên Agirî ve tevî rêzdar Ebdula Hesenzade Sekreterê Giştiyê PDK Îranê hatiye pêk anîn, em bala ve bo pirs û bersivên girînge wê hevpeyvîn radikêşîn:

Doma wê 2

**Nigeraniya Komara Islamî derheq avabûna sîstemeke Federalî di Îraqê de**

:Zanyar

**”Îran qurbaniyê terorîzmê”**

: Kurmanc Hakkî


Êrîşa ser Navenda Cîhaniye Bazirganî (WTC) gişt cîhan hejand. Piştî wê êrîşa herî

weke toreke mediyayî ya girîng di parçeyên din ên Kurdistanê de jî dide xuya kirin, parvekirin û şirovekirina pirsên taybet bi seranserî Kurdistanê ye di her alî de. Bi vî rengî, ”Agirî” ji asta weşanek herêmî derketiye û rolek Kurdistanî dibîne.

Weşandina hejmara 500’an a rojnameya ”Agirî” derfetek e bo wergirtina ezmûnan di pêxema bihêz bûn û pêşveçûnê de. Di salên borî de, Agirî nîşan da ku ew dikare ji dezgehek medyaya çapkirî wêdetir, bibe saziyeke ragihandina stratejîk.

Saziyek ku dîrok zindî ragirtiye û nasnamame xurt kiriye. Bûye zimanê hevpar bo rêkxistina raya giştî ya Kurdistanê û bi hevregirêdana krîzên siyasî, civakî û jîngehî û .. Lewma hewce ye ku hemşêweyê hemû mediyayên din, girîngî bi pêşveçûn û pêşkewtina ”Agirî” jî were dayîn.

# Bi boneya 500 mîn hejmara rojnameya Agirî



N. Elî Munezemî

Bi boneya derçona 500 mîn hejmara rojnameya Agirî, ez dixwazim bi germî pîrozbahiyê li her kesê ku beşdarî berdewamiya gihîştina wê rojnameyê bi xwendevanan bûye, bikim.

Rojnameya Agirî li heyamê temenê xwe de, bi hêz, vîzyon û îrade xizmeta doza neteweyî, zimanê dayikê, çand û dîroka me kiriye - û di heman demê de, wekî li qada berxwedan û têkoşînê, di xebata neteweyî de roleke girîng lîstiye.

Her li hejmara xwe ya yekemin di sala 2003an ve heta îro ku hejmara 500 mîn hatiye weşandin, Agirî nirxên demokratîk pêş xistine, azadiya derbirînê parastiye, bûye qadeke nerînên piralî û li dijî sansûr û zordariyê derketiye û hetta di rûyê nerînên nakok de jî deryê wê her tim vekirî bûye.

Ev Rojname bi saya hewldanên rojnamevan û nivîskarên Kurd ên li her çar perçeyên Kurdistanê gihîştiye cihê xwe. Ew platformek girîng bûye ji bo pêşkêşkirina pirsa Kurd û ronîkirina pirsgirêkên têkildarî tevahiya Kurdistanê.

Ji bo Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê jî, Agirî hem ji bo Kurdên li welatê wan û hem jî li dîasporayê amûrek ragihandinê ya girîng bûye, û xizmeta doza rewa ya gelê me bi giştî û bi taybetî Rojhilatê Kurdistanê kiriye û dengê û raya wê partiyê gîhandiye xelkê.




Agirî xwe bi mijarên neteweyî yên têkildarî têkoşîna rizgariyê ve sînordar nekiriye.

Her wiha mijarên civakî, mafên mirovan, parastina jîngeh û xwezayê, pirsgirêkên jinan û gelek mijarên din jî nîqaş kiriye û bi wî awayî beşdarî şekildana raya giştî bûye.

Vê Rojnameyê di belavkirina agahî û nûçeyên li ser mijarên girîng û krîtîk ji bo civak û gelê Kurd roleke sentral lîstiye.

Ez hêvî dikim ku Agirî di salên pêş de jî wek dengekî azad û xaleke kombûnê ji bo gelê me bimîne.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (500)


**Spasnameya Rojnameya Agirî**

Ji hejmara 1ê ya Rojnameya Agirî ve heya niha gelek hevalên dilsoj ked dane û bi ked û pênûsa xwe rûpel bi rûpelên vê Rojnameyê xemilandine. Ew heval hêjayî xelata herî giranbuha û qedirgirtinê ne.

Lê çimku hem hejmara wan kesan zêde ye, û hem jî renge navê kesekî bê jibîrkirin, me xwe erikdar zanî bi navê Agirî spas û pêzanînekî giştî rû li wan hemû hevalan ku heta yên ku rojekê jî dema xwe bo xizmeta bi vê rojnameyê danîne, pêşkêşî wan bikin û dibêjin:

Mala we ava, û pênûsa we hertim bo xizmeta bi xak û welat bihêz û xurt be, gelek jî biborin ku me nekarî navê we yek bi yek bînin.

**Navenda Ragihandinê**
**Rojnameya Agirî**




**500 GAVÊN**
**BER BI RONAHIYÊ**

Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê
Navenda Ragihandinê